

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



**EM HELEBÇÊ
JI BÎR NAKIN!**

**HÊJE MÊJE
EMÊ NUHA ÇEND
ÇÎROK Û MESELÊN XWE
JI WE RE BÊJIN**

Kulîlk

Sal: 1989

ÇÎROK: ROVÎ Û QULING

WÊNE : PÎRO

Dibê rojekê ji rojan rovî û qulingek li çolekê pêrgî hevdû dibe.

**Her dû li wê derê dibin destbirakê hev.
Rovî Quling dawetî cem xwe dike.**

Quling dehere cem Rovî, dibe mêvan. Rovî ji mêvanê xwe re pelulekê çêdike û dixîne sê-nîkek pan.


Rovî bangî birakê xwe Quling dike:

-Fermo birako, Em xwarina xwe bixwin.

Rebenê Quling bi nikila tê sênîkê, lê mixabîn dike nake nikare wê pelûlê buxwe. Rovî dikeve ser pelûlê û di nav re jî dibê:

-Birako, mal mala te ye. Dibê tu fêdî neke.

**Quling di hundirê xwe de gelekî diqeher e.
Lê naxwaze bide xuyanî kirin.**



Rovî wê pelûlê bi kêt dixwe, zimanê xwe bi dora devê xwe dixe û dest bi sohbetê dike.

Quling fêm dike, ku hevaltiya Rovî ne ji dil e. Di dilê xwe dedibe:

-Rovî yê fênom, ger min ev tişta ji te re hişt, bila ez ji te xerabtir bim. Bi dû re, Quling ji Rovî re got:

-Birako, Mala te ava. Hevalti û mîvanperwerî heqê te. Dibê rojekê tu jî were mîvan-tiya min.

Rovî bi kêfxweşî daweta Quling qebûl kir. Roja kû Quling jê re gotibû hat. Rovî berê xwe da cem Quling. Quling dahnûyek çêkir û xist kûzekî devê wî teng.

Quling bangî Rovî kir û got:

-Fermo birako, Em xwarina xwe bixwin.

Rovî bi dora kûz ket, bîhna dahnûyê fûriya ser çavên wî, zimanê xwe bi dora kûz xist, lê kir nekir xwe negîhand dahnûyê.

Quling nikilê xwe dixe hundur kûz û bi kêt xwarina xwe dixwe. Di nav re jî vedigeri ser Rovî û dibê:

-Birako, mal mala te ye. Dibê tu fedî neke.

Rovî lê hay bû, ku Quling heyfa xwe jê hilanî. Ew hinekî mijûl bû û ji Quling re got:

-Birako, ma tu naxwaze ez te hînî çiva bikim?

Quling:



**-Ya xwastinê ez dixwazim, lê ez nikarim
çîva bidim xwe.**

Rovî:

**-Tu wî tiştî bisipêre min, gelek hêsane. Ezê
terî ya te û dêla xwe bi hevdû re girêdim.
Gava ez çîva bidim xwe, tê jî li dû min were û
bi wî awayî tê hîn bibe.**

**Quling ew tişta qebûl kir û dîsa hat lîstika
Rovî. Rovî, terîya Quling bi dilê xwe ve baş
girê da û xwe zîz kir. Rebenê Quling li vî alî
wî alî li bin guhê kefiran dikeve, dibe qêrîna-
wi. Lê Rovî, wek ku deng nayê wî her xwe di-
zîvirîne û quling bi dû xwe re dikişkişîne.
Quling ji hal dikev e. Xweşikî per pê ve namî-
ne. Laşê wî tev dibe birîn û dişeqit e.**

**Quling dîsa fêm kir, ku Rovî ew xapand. Lê
nexwast wê tiştî bide xuyanî kirin.**

Quling bi zor ji Rovî re got:

**-Gelek sipas ji bo vê hevaltî û mamostatîya
te. Ez vê qencî ya te ji bîrnakim.**

**Çendak derbas bû, birînên Quling rehet
bûn, pûrt bi canê wî şîn hat. Quling berê xwe
da cem Rovî. Wek ku tiştek nebû ye ketin
sohbetê. Di nav sohbetê de Quling ji Rovî re
qot:**

**-Birakê rovî, ma tu naxwaze hînî firandinê
bibe?**

Rovî:



-Ma baskên min heye, ku ez pê bifirim?

Quling:

-Ezê te li ser baskê xwe kim û bifirim, tê jî bi vî awayî hînî firandinê bibe.

Ev tişta ber bi serê Rovî hat. Rovî li ser baskên Qulig sar bû, quling hêdî hêdi bi hewa ket. Her ku Quling bêtir bi hewa diket, ji Rovi dipirsî:

-Birako, ma tu Dinyê çawa dibîne?

Bersîvên Rovî jî gorî bilid firandina Quling dihat guherandin:

-Dinya ji min wek tara seradê xuya ye. Wek tara bêjingê xuya ye. wek tara morxulê xuya ye...

Quling her bêtir bi hewa diket û dipirsî:

-E birako, ma nuha dinya çawa ji te xuya ye?

Rovî:

-Nuha dinya ji min wek qula derzîyê xuya ye.

We gavê Qulin ji Rovî re got:

-Birakê Rovî, Baskê min yê tu li ser gelekî qerimî. Ji kerema xwe, xwe bavêje ser baskê din.

Gava Rovî xwe avêt ser baskê din, Quling baskê xwe berjêr berda û Rovî ser serî hat erdê...



QUNCIKA BAJARÊN KURDISTANÊ

BEDLÎS -1-

NAV:Merov nizane, ku kengî bajar hatiye avakirin. Lê nav ji kelha xwe girtî ye. Keleh berî çêbûna îsa di qirnê çaran de, ji alî serleşkerekî îskenderê mezin hatîye avakirin. Wî serleskerî navê xwe li kelehê danî ye.

DîROK (TARÎX) : Herêma Bedlîsê jî, wekî der dora xwe pêşî di destê Arî, Hûrrî, Mîtanî û ûrartû yan debû. Berî çar hezar sal;gava di destê ûrartûya debû, gelek qesr û qonax li vir hatine avakirin. Gelek şopê dîroka ûrartûya li vê herêmê tê dîtin. Berî çêbûna îsa di qirnê heftan de, ev herêma kete bin destê Meda. Qirnekî di destê Meda de ma û paşî kete destê Persa(Farisa). Berî

mîladê (çêbûna îsa) di qirnê çaran de îskender weke gelek alîyê Kurdistanê ev herêma jî kir destî xwe. Bi dû mirina îskender de, demekê Roma û Bîzansa jî ev herêm xistin bin destê xwe. Piştî mîladê di sala 641 de,



Hz. Omer ev der dora fetih kir û tevî emperatorîya îslamê (Areba) kir. Di sala 1084 de Bedlîs ketedestê Selçûkîyan.

Li gor lêkolandina dîrokê, di vê demê de Exlat ji Bedlîsê bêtir dihate nasîn. Bedlîs, Exlat û derdora wan ji sala 1150 heta 1670 di destê Kurda de bû.


Şerefşanê Bitlîsî û malbata wî di vê demê de mîrîti kirin. Pirtûka bi navê "ŞEREFNAME" di van tarîxan de hatîye nivîsandin.

CîH: Bedlîs li jora Firat û li rojavayê gola wanê dikeve. Li rojhilata wê wan, li başûr Sêrt, li bakurê wê jî Qerekose heye. 6 qezey-ên bajêr hene. 247 gund jî bi Bedlîsê ve girê-dayîye. Li bajêr 25 000 rûneiştevan rûdinin.

Qezeyên Bedlîsê evin: Adilcewaz, Exlat, Mûtķî û Tatwan. Adilcewaz û Tatwan li tenış gola Wanê rêzbûnin.

ÇîYA û ÇEM : Di herêma Bedlîsê de çemê mezin tunene. Çemê herî mezin Avareş (Karasu) e. Avareş li nêzî gola Wanê derdikeve, bes ava wê tevî golê nabe, tevî çemê Mûradê dibe. Çemê Bedlîsê jî teve çemê Dîcle dibe. Çemê Xerzan jî çemekî ne mezin e.

Gola herî mezin gola Wanê ye. Di nav gel de kesek jê re nabê gol. Di helbestan û çîro-kan de her bahra Wanê derbas dibe. Lê jî ber ava wê naçe ser tu bahrê din, merov dikare



jê re bêje gol e.

Golekî din jî bi navê gola Nemrûd heye. Ev golek krater e. Li ser çiyayê Nemrûd û ji bahrê 2400 m. bilind e.

Herêma Bedlîsê gelekî bilind û bi piranî çiyan e. Deşt pir kêmîn. Bes mirov dikane navê deşta Exlat û Rehwanê bêje.

Çiyayê herî bilind çiyayê Sîpan e. Li bakurî gola Wanê ye. Çiyakî tenê û volqanîk e. Bilindîya wî 4434 metro ye. Li rojavayê gola Wanê jî çiyayê Nemrûd heye. Ew jî çiyakî wolqanîk e. Bilindîya wî 3050 m. ye. Çiyayên din Şatâk, Bedlîs, Sason û Hacreş in.


HEWA: Ev herêma ji bahrê bilindîya wê 1500 metro ye. Ji ber vê yekê zivistana gelekî sar e. Zivistan gelek zû tê û dirêj dajo. Zivistanan berf gelek dibare.

Havîn li vê derê gelek kin e. Lê baş germ e. Germayî di nabêna 25 û 28 dereca tê guher-tin.

ÇANDINÎ: Mirov dikare ji 4/5 erdê vê herêmê çandinyê bike. Bi piranî genim, ceh, çeltûk uhw. tê çandin. Genim bi piranî li deşta Exlatê û Tatwanê tê çandin. Fasûlî, nok û li hinek deran jî nîsk tê çandin.

Çandinîya ji bo endustrîyê jî cîhekî taybetî digre. Tûtin, pencar û kenewîr di serî de mirov dikare bihejmære. (Dûmahîk heye)

MIJULÎ



DIBISTAN

**Dibistanên me vebûn
Bira bijî Kurdistan
Berî me jî xem hebûn
Bijî bijî Kurdistan**

**Me dayik ne xwenda bû
Bira bijî Kurdîstan
Dest li nava qeyda bû
Bijî bijî Kurdistan**

**Lê em keçê nûhatî
Bira bijî Kurdistan
Giş xwenda û jêhatî
Bijî bijî Kurdistan**

**Ji bo welat dixwînin
Bira bijî Kurdîstan
Zilma dijmin dibînin
Bijî bijî Kurdistan**

**Em pêşmergên bi çûkin
Bira bijî Kurdîstan
Hin qîzin hinek bûkin
Bijî bijî Kurdistan**

APÊ XERÎBO

QOLÇÎ Û GUNDÎ

Rojekê Mîrzo barek êzing dibe bajêr, êzingê xwe difroşe, asûkê xwe dikire û dixwaze hinekî li nav bajêr bigere. Lê di wê demê de, feqîrê gundîyan ji ber qolçîyan xweşikî nikarîbûn cigarak bi kêfxweşî vexwrina. Qolçî bi dû gundîyan debû, li ser wan digerîya û gava tûtin li ser wan bigirta, ceza ji wan distend.

Lê Mîrzo hingî dabû dilê wî, sûnd xwaribû, ku ewê vê carê li nav bajêr cigara "kaçax" vexwe.

Gava qolçî dît, ku dûxan bi ser yê gundi ket, bi rev xwe gîhand cem wî. Li ser wî gerîya, barê kerê wî danî, li nav bar gerîya, lê tu tûtin nedît. Qolçî gelekî qeherî, lê nekarîbû tiştek bikira.

Mîrzo barê xwe avêt ser kerê û rîya xwe berdewam kir. Piştî sed gavekî ji Qolçî bi



dûr ket, dîsa dûxan bi ser serê Mîrzo ket. Qolçî bi lez xwe gîhand wî, wek cara din li ser wî gerîya, barê wî ji hevdû xist, lê tu tûtin nedît. Qolçî, tu nemabû ji qehra biteqîya.

Mîrzo barê xwe bar kir, qederkî meşîya û carde dûxan bi ser serê xwe xist.

Qolçî bi rev çû cem Mîrzo, bû helk helka wî û ji hêrsa bi zorê gotin digîhand hevdû. Qolçî ji Mîrzo re got:

-Heyran, welleh te kezeba min reş kir. Bi soz û telaq, cê tûtina xwe rê min bide, ez tu cezayî ji te nastînim.

Mîrzo bawerî anî, ku Qolçî wî tiştî ji dil dibê. Mîrzo çû cem kerê xwe, tûtina xwe ya di nav paçikekî pêçabû ji guhê kerê derxist û rê Qolçî da.

Qolçî bîhna wî gelekî teng bû, lê ji bo soz dabû û bi telaqa sûnd xwaribû, tu ceza ji Mîrzo negirt.


Mîrzo di bin simêla de dimizmîzi. Çend gava ji Qolçî dûrket, cigara xwe pêça û dîsa dûxan bi ser serê xwe xist. . .

Bavê Hêvî

ANATOMIYA SERÊ MIROV

Jİ KURMANCI

20



Raportor : Memo Yetkin

kurdî	türkî	fransizi	îngilizi
1-18 SERİ	BAŞ	TÊTE	HEAD
1- tasa serf, tepika serf, tepe serf	kafa taşı kafa taşı zirvesi	crâne sommet du crâne	crown of the head top of the head
2- patik	arkafa	occiput	back of the head
3- por	saç	chevelure	hair
4-17 RÛ	YÜZ	FACE	FACE
4-5- enî	alın	front	forehead
4- pêşcênk, besik	alın çıkışntısı	bosse frontale	frontal eminence
5- navçav	iki kaş arası, belce	glabellé	superciliary arch
6- cênk	şakak	tempe	temple
7- çav	göz	œil	eye
8- hinarik	elmacık	pommette	checkbone
9- dém, lam, rû	yanak	joue	cheek
10- poz, difin, kepû, lût, bêvil	burun	nez	nose
11- berrûmet		sillon naso-générien	nasolabial fold
12-		sillon sous-nasal	philtrum
13- dev	ağız	bouche	mouth
14- kujê lêvê	dudakların birleşme yeri	commissure des lèvres	labial commissure
15- çene, erzîng	çene	menton	chin
16- çenegeh	çene çukurcuğu	fossotte mentonnière	dimple in the chin
17- çeleffik, çen alçen	altçene üstçene	mâchoire inférieure mâchoire supérieure	jaw
18- guh	kulak	oreille	ear
19-21 STÛ	BOYUN	COU	NECK
19- qırık	boğaz	gorge	throat
20- çala gerdenê		fossette sous-sternal	hollow of the throat
21- çema stû	ense	nuque	nape of the neck

QUNCIKA XAPÎNOKA

**Hun dikanin li ser hev van tişanan bi lez
bêjin ?**

1- Çel serçe ji wê de hat

Çel serçe ji vir de çûn

Wî çel serçî ji vî çelserçî re got


Çel serço, hun ci çelserçenin.

2- Teşt, mişt nîsk.

3- Sim û tim tim simeîle.

**4- Tayek dezî, di qulika derzîya
diya mi da vizî vizî.**

VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHİNIN HEV



PÊZANÎN


**1- Di mêtînê nasekine
Li bazarê nayê firotin
Lê gelekî şêrîn e.
Ew çiye ?
Bersîv:**

**2- Tîşkî min heye
Dirêj, dirêj
Kevan dirêj
Ew çiye ?
Bersîv:**

**3- Hesin, bizin
Gayê mezin
Tev dilîzin
Tev dibezin
Ew çiye ?
Bersîv:**

**4- Bênder ji goşt
Cercer ji hesin
Avê bidê bajo
Ew çiye ?
Bersîv:**

QUNCİKA MATAMATİKÊ



$14 - 9 = \underline{\quad\quad\quad}$

$35 + 32 = \underline{\quad\quad\quad}$

$18 - 2 = \underline{\quad\quad\quad}$

$25 + 26 = \underline{\quad\quad\quad}$

$11 - 3 = \underline{\quad\quad\quad}$

$69 + 14 = \underline{\quad\quad\quad}$

$15 - 8 = \underline{\quad\quad\quad}$

$42 + 56 = \underline{\quad\quad\quad}$

$19 - 6 = \underline{\quad\quad\quad}$

$38 + 28 = \underline{\quad\quad\quad}$

$15 + 5 = \underline{\quad\quad\quad}$

$61 + 35 = \underline{\quad\quad\quad}$

$5 + 7 = \underline{\quad\quad\quad}$

$27 + 54 = \underline{\quad\quad\quad}$



$14 + 2 = \underline{\quad\quad\quad}$

$15 + 49 = \underline{\quad\quad\quad}$



$6 + 8 = \underline{\quad\quad\quad}$

$48 + 30 = \underline{\quad\quad\quad}$

$8 + 7 = \underline{\quad\quad\quad}$

$65 + 25 = \underline{\quad\quad\quad}$

ÇEND PEYVÊN PÊŞÎYAN YÊN SWEDÎYAN û KURDAN



- * Agir ketibû mala yekî, yê din ser û pê li ber dikizirand.
 - Den enes död är den andres död. (Li ba swediya)

- * Bi dilopê baranê bîr tije nabe.
 - En svala gör ingen sommar. (Li ba swediya)




- * Şam şekir e, lê welat jê şêrîntir e.
 - Borta bra, men hemma bäst. (Li ba swediya)

- * Bahar hat, rûmeta kincê zivistanê hilat.
 - (Bi swêdî nayê gotin, ji ber li vir tim zivistân e.)

KEÇA "EFENDÎ"



XAÇEPIRS



BERSÎVA PÊZANÎNAN

1) Her-her dîwar

Mermer dîwar

Xatûneke, çel nobetdar.

Ew çiye?

Bersiv: Ziman

2) Dîkek e, dîkwanek e,

Çar mîhin, beranek e,

Ew çiye?

Bersiv: Ziman

3) Çi ji balgî nermtir e?

Bersiv: Dev û diran



4) Xan-manekî tarî

Tijî stûne çiloxwarî

Ew çiye?

Bersiv: Dev û Ziman

BERSİVA XAÇEPIRSAN




					6
1→	S	E	E	T	
2→	M	E	Q	E	S
3→	D	I	R	Ê	N C E K
4+	B	E	R	O	S
			O		
			K		
5→	R	E	F	I	K

6 : ?



**KEREKÎ ME HEBÛ
Û KUNDIREKÎ ME
KERÊ ME
KUNDIRÊ ME KOT KOT
ME JÎ ÇIROK
Û MESELÊN XWE
YÊN VÊ HEJMARÊ
JI WE RE GOT**

Kulîlk





YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !



UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNIŞAN

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

PRIS : 10:- skr
BIHA